

**Berhema Mela Mehmûdê Bazîdîyî**

**KÊŞANA KARÊN KURDÎ**

(Nirxandin - Metina Sadekirî, Latinîzekirî - Faksîmîle)

**Mikail Bülbül - Mustafa Öztürk**



**Weşanêñ Weqfa Mezopotamyayê 7, Ziman 5**

Berhema Mela Mehmûdê Bazîdîyî, Kêşana Karên Kurdî  
(Nirxandin - Metina Sadekirî, Latinîzekirî - Faksîmîle)

**Çapa Yekem:** Kanûna Pêşîn 2020, Stenbol

**ISBN:** 978-605-80975-6-8

**© Weqfa Mezopotamyayê**

Mezopotamya Eğitim Bilim Sanat Sağlık ve Kültür Vakfı İktisadi İşletmesi  
Hemû mafêñ vê pirtûkê parastî ne bê destûr nayê kopîkirin.

**Nivîskar:** Mikail Bülbül, Mustafa Öztürk

**Mîzanpaj:** A Grafik Creative Solutions - [www.agrafik.web.tr](http://www.agrafik.web.tr)

**Bergsazî:** Hasan Asan

**Çapxane:** Alioğlu Matbaacılık Bas. Yay. ve Kağı. San. Tic. Ltd. Şti. Orta  
Mah. Fatin Rüştü Sk No: 1-3/A Bayrampaşa-İstanbul. Tel: 0212 612 95 59

**Sertifika No:** 45121

**Weqfa Mezopotamyayê**

Mezopotamya Eğitim Bilim Sanat Sağlık ve Kültür Vakfı İktisadi İşletmesi  
Urfa Yolu Üzeri, Çeysa Serhat Plaza A Blok  
Kat:11 No: 29 Kayapınar/Diyarbakır

**Sertifika No:** 42382

**Tel:** 0412 229 40 50 - 0549 440 22 20

[www.weqfamezopotamyaye.com](http://www.weqfamezopotamyaye.com)

[www.mezopotamyapirtuk.com](http://www.mezopotamyapirtuk.com)



### **Mikail Bülbül**

• Di sala 1978an da li Qosara Mêrdînê çêbûye. Mastera wî li Zanîngeha Mardin Artukluyê, li ser edebîyata kurdî ye. Li Zanîngeha Zaxoyê li ser sentaksa kurmancî doktora kirîye. Di salen 2012-2017an da li Zanîngeha Mardin Artukluyê wekî mamostayê beşa kurdi xebitî. Niha li Weqfa Mezopotamyayê wekî koordinatör dixebite.

### **Mustafa Öztürk**

• Di sala 1980yî da li Qosara Mêrdînê çêbûye. Perwerdehîya xwe ya bilind li ser edebîyata tirkî qedandîye. Di navbera salên 2002 û 2015an da mamostatîya ziman û edebîyata tirkî kirîye. Ji 2015an vir ve li Zanîngeha Mardin Artukluyê mamostatîya ziman û edebîyata kurdî dike. Hîn jî di qadêن edebîyata kurdî, tirkî û berawirdkirina van her du edebîyatan da, xebatêن xwe yên akademîk didomîne.

# NAVEROK

PÊŞGOTIN ..... VII

## DESTPÊK

DESTPÊK Û SALOXDANA BERHEMÊ ..... 1

## BEŞA YEKEM

NIRXANDINA BERHEMA MELA MEHMUDÊ BAZÎDÎYÎ

Zimanê Bazîdîyî ..... 5

A. MORFOLOJÎYA KARAN ..... 10

1. Kar û dem ..... 11

    1.2. Dema niha ..... 11

    1.3. Dema borî ..... 12

    1.4. Dema Dahatî ..... 12

2. Kar û avahî (voice) ..... 13

    2.1. Avahîya aktîf (active voice) ..... 13

    2.1. Avahîya pasîf (passive voice) ..... 13

3. Raweya fermanî ..... 13

4. Bikernav, berkarnav û formên karî ..... 14

5. Têperî û têneperî ..... 15

6. Karêñ lêkdayî ..... 16

7. Rêkeftina cihnavî ..... 16

8. Karêñ bêrêz ..... 16

9. Forma ismê mekan ya karan ..... 17

10. Hejmar di karan da ..... 17

B. SENTAKS ..... 18

ÇAVKANÎ ..... 20

## BEŞA DUYEM

METINA BERHEMÊ YA SADEKIRÎ

RÊBAZA SADEKIRINA METINÊ ..... 25

METINA BERHEMÊ YA SADEKIRÎ ..... 26

## BEŞA SÊYEM

METINA BERHEMÊ YA LATÎNÎZEKIRÎ

ELFABEYA TRANSKRÎPSÎYONÊ JI BO METINÊ ..... 63

METINA LATÎNÎZEKIRÎ ..... 64

## BEŞA ÇAREM

FAKSİMILE ..... 97



## PÊŞGOTIN

Mela Mehmûdê Bazîdîyî berhema xwe ya “Kêşana Karêñ Kurdî” di sala 1886an da ji bo hînkirina kêşana karêñ kurdîya kurmancî nivîsîye. Navê berhemê ne ji alîyê Bazîdîyî ve lê ji alîyê A. Jabayî ve û bi frensizî wekî “Conjugaison des Verbes Kurdes” hatîye danîn ku kurdîya wê dibe “Kêşana Karêñ Kurdî”. Ev berhema Bazîdîyî jî wekî berhemên din gelekî giring e ku di koleksiyona Aleksandre Jabayî da cih girtîye. Di vê berhema tematîk da ji bilî morfolojiya karêñ kurdî, li ser sentaksa kurdî jî agahîyan giring hene.

Me di vê xebatê da, hem latînîzekirin û sadekirin û hem jî nirxandina berhema Bazîdîyî kirîye. Herweha me kopîya orjînal ya berhemê jî di beşa dawî da daye. Yanî di vê pirtûkê da çar beş hene ku beşa yekem nirxandina berhemê, beşa duyem metina berhemê ya sadekirî, beşa sêyem metina berhemê ya latînîzekirî û beşa çarem jî kopîya orjînal ya berhemê ye. Me metina resen, li gor kurmancîya îro sade kirîye ku zimanê wê sivik bibe û hêsanter bihê famkirin. Bi vî awayî her kes dikare bi hêsanî sûdeyê jê wergire. Sadekirin ji alîyê rastnivîsê ve, li gor rêz û rîçikên Rêbera Rastnivîsinê ya Weqfa Mezopotamyayê ve hatîye kirin. Metina latînîzekirî transkrîpsîyona metina resen e û bi herfîn transkrîpsîyonê yên taybet hatîye kirin. Di beşa dawî da jî me metina resen ya bi herfîn erebî daye ku mirov bikarin xwe bigihîjinê û xebatêna cuda li ser wê bikin. Herweha bi vî awayî, berawirdkirina metina resen, latînîzekirî û sadekirî minkun dibe û bi vî awayî mirov dikarin şaşî û kîmasîyêne me jî tesbît bikin. Lewra destnivîsên Bazîdî ji alîyê xwendinê ve hinekî zehmet in û mimkun e ku me jî şaşî kiribin.

Em ji bo Reşo Zîlanî spasdar in ku metina resen û ya latînîzekirî xwend û pêşnîyazên xwe bi me ra par ve kirin. Şehab Welî wergerandina hin têbînî û îzahêن bi fransizî kirin û em spaşîya wî jî dikan. Herweha Sabîr Abdullahîzad jî kontrola peyv û besên farisî kirin û em malavîya dikan. Dîsa em spasdarê Malmîsanij û in ku di xwendina hin peyvan da alîkarîya me kir.

Em kîfxwêş in ku berhemeka weha giring pêşkêşî pirtûkxaneya kurdî dikan û em hêvî dikan ku dê bigihîje ber destêna gelek kesan û sûdê jê wergirin.

**Mikail Bülbül - Mustafa Öztürk  
Dîyarbekir - Mêrdîn, 2020**



## DESTPÊK Û SALOXDANA BERHEMÊ

Mela Mehmûdê Bazîdî bi berhemên xwe yên giring, yek ji kesên herî giranbiha yê rewşenbîrîya kurdî ye. Wî bi xebatê xwe yên li ser dîrok, ziman û folklora kurdan xizmeteka mezin kirîye. Herçend li ser dîroka çêbûna wî tiştekî teqez tune be jî li gor gelek kesan di 1797an da li Bazîdê çêbûye (Öztürk, 2017a, r. 17,19). Ji bo wefata wî dîsa dîrok ne teqez be jî wekî 1867 xuya dike (Öztürk, 2017b, r. 62).

Ev berhema ku di *Koleksiyona Aleksandre Jaba ya Destnivîsên Kurdî* da bi hejmara KURD 46an cih digire, yek ji berhemên giring û dîrokî ye ji bo zimanî kurdî<sup>1</sup>. Bazîdîyî di wereqa “23b”yê ya vê berhemê da hem behsa naverok û rîbazê hem jî armanca nivîsîna vê xebatê bi vî awayî dike û dîyar dike ku ev berhem yekser ji bo A. Jabayî nivîsiye:

*Me'lûmê te bitin ku ev qewa'idêd ku di vê rîsalê da hatîye zikir û beyan kirin, ji usûlê qewa'idêd 'ilûmêd nehw û serfê ne. Weku kesek zihin bidetin di kitêbêd 'erebî danê evan qewa'idan dibîne û hem di kullê ef'alan dane jî carî dîbin; 'imûmî ne, ne xisûsî ne. Derk, dirayet, fehm, feraset divê ku evan qewa'idêd hatî gotin mitala û fikir bike û ji boy xo bigire mêtîn. Û ef'alêd mayî jî bi wan biwezine û li wan qiyas bike û nexelite. Lewranê weqt teng bû, beyana hemûyê mimkin nebû. Û ger ne, min dê ji boy xatira Mîr Jaba yê konsil, bi niyatekî qenc bikira. Hinde miyesser bû. Wallahû e'lem. 1283.*

Ev berhema Bazîdîyî ku niha em pêşkêş dîkin ji bo dîroka xebatê kurdî jî gelekî nirxdar e. Bi qasî ku em dizanin mînaka xebateka bi vî rengî ku bi taybetî li ser kêşana karan e, tune ye. Xebateka din ya Bazîdîyî jî hebû ku bi berfirehî cih dabû mijarêñ rîzmanê lê ew xebat mîna vêya bi taybetî li ser mijarekê nebûû ji hev pir cuda ne. Em dikarin saloxdana vê berhemê weha bikin:

**Navê Berhemê:** Di destnivîsê da tu nav yan sernaveka kurdî ji bo berhemê nehatîye nîşandan; lêbelê A. Jaba navê berhemê bi fransizî wekî “Conjugaison des Verbes Kurdes” nivîsiye. Kurdiya vî navî jî dibe “Kêşana Karêñ Kurdi”.

---

<sup>1</sup> Ji bo agahîyêñ berfireh yên li ser koleksiyona A. Jabayî binêre, Öztürk, M. (2017). *Koleksiyona Aleksandre Jaba ya destnivîsên kurdî (vekolîn û saloxdan)*, Ankara: Lîs

**Mielîf (Daner):** Mela Mehmûdê Bazîdî

**Cureyê Berhemê:** Pexşan (Rêzimana Kurdî)

**Zimanê Berhemê:** Kurdî (Kurmancî)

**Hejmara Pelan, Cureyê Xetê, Taybetîyê Berg û Kaxezê û hwd:** Nisxe 48 wereq (96 rûpel) e. Metin di nava 46 wereqan da ye. Wereqa “1a”yê vala ye. Bi elfabeya erebî û bi xeta ruq’eyê hatîye îstînsexkirin. Berg tune ye û kaxezeka zer û ji rêzê hatîye bikaranîn. Di hin wereqan da ji bo rêzan xêz hene û hin ji wan jî vala ne. Hejmarêr rêzan ji hev cuda ne. Li bin û li ser hin rêzên resen, ji alîyê A. Jaba ve wergerandina wan ya fransizî heye.

**Ebada Destnivîsê:** 22 cm × 15 cm.

**Pêşîya Destnivîsê:** (wr. 3b) Nimûden. Nîşan dan. Fi’lê mazîyê me'lûm. Min nîşan da, Te nîşan da, Me nîşan da, We nîşan da, Wî nîşan da, Wan nîşan da ...

**Dawîya Destnivîsê:** (wr. 48a) ... Ismê mef’ûl. Î hatî lezandin. Ismê mekân. Cîyê lezê. Ismê zeman. Çaxê lezê.

**Qeyda Îstînsexê:** (wr. 48a) Temam şod der weqtê ‘esir. Lî eclî Mîr Jaba fi Erzirom. 1283.

**Mistensîx:** Mela Mehmûdê Bazîdî

**Dîrok û Cihê Îstînsexê:** Hicrî: 1283, Erzirom.

Mîladî: 1866, Erzirom.

**Têbînîyê Giring:** Ev destnivîs, rîsaleyeka ji bo fîrkirina zimanê kurdî ye. Bazîdî ji bo şexsê Jaba amade kirîye. Dabeşkirina naverokê û ravekirin di bin bandora tîpolojîya zimanê erebî da ye: Kar (dem, rawe, têperî, kêşan, erêni, neyîni ...) zayenda navdêran, mîjer, hevalkar, hevalnav, cihnavk, ev hemû mijarênu ku di nav vê berhemê da ne. Di du cihan da rahênan li ser hevokan hene. Jaba ew ji xwe ra wergerandine zimanê fransizî. Di wereqa “1a”yê da Bazîdî ji bo Jabayî bîranînuka hestîyar û kurt nivîsiye. Jaba ev bîranîn li jora heman wereqê wergerandîye fransizî (wr. Zehrîye).

Di heman cihî da Jabayî derbarê vê berhemê da bi fransizî hin têbinîyê xwe jî nivîsîne. Li her du alîyêna jora wereqan hejmarêr rûpelan bi reqemên erebî hatine tomarkirin û li wereqên “a”yê (çepê) jî bi latînî hatine nivîsin.

# BEŞA YEKEM

NIRXANDINA BERHEMA  
MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎYÎ

---



## NIRXANDINA BERHEMA MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎYÎ

Ev berhema Bazîdîyî, bi giranî li ser morfolojîya kêşana karan e û zêdetirî bîst karên kurdî wekî mînak pêşkêş kirine. Wî kar li gor cihnavkên kesane û li gor demêن borî, niha û dahatîyê û neyînîya van deman û dîsa li gor raweyêن fermanî, aktîf û pasîf û hwd kêşane. Lê herçend piranîyê berhemê ji kêşana karan pêk dihê jî, beşek biçûk ji vê xebatê li ser sentaksa kurmancîyê ye û behsa hêmanêن hevokê û hevokên curbicur dike. Bazîdî bi xwe jî di vê xebatê da dîyar kirîye ku berhema wî ji nehiw (sentaks) û serfê (morphology) pêk dihê û weha dibêje: “*Me ’lûmê te bitin ku ev qewa ’idêd ku di vê rîsalê da hatîye zikir û beyan kirin, ji usûlê qewa ’idêd ’ilûmêd nehw û serfê ne.*” [wr. 23b].

Ev berhema Bazîdîyî zêde nayê zanîn û heta niha nehatîye çapkîrin. Aydin (2019) li ser vê berhemê gotarek nivîsiye ku gotara wî bêtir danasîna berhemê ya ji alîyê fizîkî, nasnameyî û naverokî ye û li ser naveroka wê analîz cih nagirin.

Bazîdîyî di çerçoveya morfolojîya kurmancîyê da, ne tenê li ser karan û kêşana wan, lê li ser beşen axiftinê (parts of speech) yên din jî sekinîye. Wî di bin tesîra tîpolojîya rîzimana erebîyê da, beşen axiftinê wekî sê beş dîtine ku “kar”, “navdêr” û “herf” in. Mijarêن wekî yekhejmarî, duhejmarî û pirhejmarîya navdêran, nîsbet, îzafe, bikaranîna daçekan û hwd bi vê mantixa dabeşkirina erebîyê, tê da cih girtine. Em dê di vê xebatê pêşî li ser taybetîyêن zimanê Bazîdîyî û piştra jî li ser naveroka berhemê nirxandinan bikin.

### Zimanê Bazîdîyî

Bazîdî ji ber ku li gor tîpolojîya zimanê erebî ev berhem nivîsiye hemû têgihîn rîzmanî jî bi erebî ne. Eger em lîsteya termêن ku Bazîdîyî bi kar anîne, bidin; hem mijar hem jî dewlemendîya naveroka xebata Bazîdîyî dê hêsanîr bihê famkirin. Termêن ku Bazîdîyî bi kar anîne û li hember wan jî bergindêن ku îro dihêن bikaranîn, ev in:

<b>alet</b>	: navgîn
<b>cem’i</b>	: pirhejmar
<b>emr</b>	: ferman
<b>emrê hazırî</b>	: raweya fermanî
<b>esmau'l-işarê</b>	: navêن nîşanê